



KUR

Şopên Tiliyan Û Eurodac

Agahiya li gorî Artîkel 29 (3) ya Hevpeymanê (YE) Nr. 603/2013 ji bo hemwelatîyên dewletên-cîhana-sêyemîn yan jî kesên bêhemwelatî, ku îlegal li dewleteke endam bicih bûne

Eger tu bi awayekî îlegal li dewleteke Dublinê bijiyî¹⁾, sazî dikarin şopên tiliyên te bigirin û pêşkêşî cihê agahiyên şopên tiliyan yê 'Eurodac'ê bikin. Armanca bingeîn ya vê ew e, ku em fêr bibin, te berê serî li penaberiye daye yan na. Şopên tiliyên te dê li cihê agahiyên Eurodacê neyên qeydkirin lê eger te berê li welatekî din serî li penaberiye dabe, dibe ku tu li welatê din bêyî vegerandin.

Gava kalîteya şopên tiliyên de xirab be, ji ber sedemên din yê wekî te zirarê dane tiliya xwe, dê şopên tiliyên te di teqez û bê şik dîsa bên girtin.

Eurodac ji aliyê ajanseke Yekîtiya Ewropayê ya bi navê eu-LISA ve tê birêvebirin. Agahiyên te dibe tenê ji bo bîrara hiqûqî bên bikaranîn. Tenê pergala navendî ya Eurodacê agahiyên te digire. Eger tu di siberojê de li dewleteke din ya Dublinê serî li penaberiye bidî, şopên tiliyên te dê cardin ji bo qeydkirina nav Eurodacê bên girtin. Agahiya li Eurodac qeydkirî dê bi dewlet yan ji rêxistinên din yê ne girêdayî dewletên Dublinê re newe parvekin.

- 1) Ji bo tevahiya Yekîtiya Ewropayê derbasdar e (Awistîrya, Belçîka, Bulgaristan, Xirvatistan, Kîpros, Komara Çekê, Danîmarka, Estonya, Finlenda, Fransa, Almaniya, Yewnanistan, Macaristan, Îrlanda, Îtalya, Letonya, Lîtvanya, Lûksembûrg, Malta, Nederlenda, Polonya, Portûgal, Romanya, Slovakiya, Slovenya, Spanya, Swêd, Keyaniya Yekbûyî) û çar welatên 'şirik' yê Hevpeymanî Dublin (Norwec, Îslenda, Swîsre û Liechtenstein).

©Yekîtiya Ewropayê 2014

Destûra kopiyê hatiye danîn. Destûra bo bikaranîn û kopîkirina wêneyên şexsî rasterast di destê xwediye destûra kopiyê de ye.

Detayên têtikiliyê

Adres û detayên saziya bo penaberan

Bundesamt für Migration und Flüchtlinge (BAMF)
Frankenstraße 210
90461 Nürnberg
Tel: +49 (0)911 943 0
Faks: +49 (0)911 943 10000
Email: service@bamf.bund.de

Adres û detayên lêkolîna Eurodac

Bundeskriminalamt (BKA)
65173 Wiesbaden
Tel.: +49 (0)611 55 0
Faks: +49 (0)611 55 12141
www.bka.de

Eger saziyên me fêr bibin, ku te li dewletekê din serî li penaberiye daye û pêkan e ku ew dewleta din ji bo lêkolîna serlêdana te perpirsyar e, wê demê ev saziyên me dê bêtir di derbarê pêvajoya nûpêkhatî de û di derbarê bandora wê de û di derbarê mafên te de agahî bidin te.

